

Hûn me
ditepisînin lewma
em deng nadin!

»»» R:7



Nansnameya
hebûnê

»»» R:2

Zimanê
Kurdî

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (368) 21-02-2020 Buha (1000) Tûmen

Girîngi-
ya zimanê
zikmakî di
şunaxwaziya
neteweyî de

»»» R:8



Di Feransayê de bo rêzgirtin ji şehîd “Dr. Qasimlo” semînarek hate lidarxistin

Roja Duşemî, 28`ê Rêbendanê, di yek ji holên Meclîsa “Sena” ya Feransayê de, semînarek bo rêzgirtin ji rêberê mezin û navdar ê gelê Kurd, şehîd “Dr. Qasimlo” û hevalên wî, bi destpêxeriya “Enstîtuya Kurd”, hate lidarxistin.

Ew semînare ji çar panêlan pêk hatibû, panêla yekem ji aliyê “Coyis Bilû” ve bi rê ve çû ku, bo endam û xizm û dostên nêzikî şehîd “Dr. Qasimlo”, hatibû terxankirin, ku pêk hatibûn ji “Mîna Qasimlo”, keça “Dr. Qasimlo”, “Ebdullah Îzêtpûr” kurmamê “Dr. Qasimlo” û “Dr. Hesên Şetewî” xwarziyê “Dr. Qasimlo”, ku peyama wan ji aliyê “Dr. Xusrew Ebdullahî” ve hate xwendin, û herwisa filmeke Mehdî Xanbaba Têhranî jî hate nîşandan.

Di panêla Duyem de, li destpêkê filmek li ser rewşa xebata PDKÎ di heyama salên derbasbûyî de hate nîşandan, ew panêla ku bo PDKÎ û aliyên siyasî yên Kurdistanê û herwisa çend kesayetiyên din ên Kurd, pêk hatibû ji aliyê Senator “Rêmi Firo” ve bi rê ve çû. Herwisa di panêla



Duyem de, peyama Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî”, ji aliyê cihgirê yekem yê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Hesên Şerefî” ve hate pêşkêşkirin.

Beşdarbûyên din yên panêla Duyem wiha bûn: “Berpîrsê wê demê yê ofîsa Mamosta Şêx Îzedîn Husênî, Ehmed Eskenderî, sekreterê Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê Îranê, Ebdullah Muhtedî, serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê (Bakurê Kurdistan), Mesûd Tek û Ezîz Mamilê, nûnerê berê yê PDKÎ li welatê Feransayê, Femandeyê berê yê Hêza Pêşmerge û Endamê serkrdayetiya Partiya “Şiyû`î” ya Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê), Mela Mihemed Ciwanroyî û herwisa Fatoş, hevjinê hunermendê mezin ê Kurd, Yilmaz Gunêy”.

Panêla sêyem, bo kesayetiyên Îranî hatibû terxankirin ku ji aliyê mamostayê zanîngehê, “Dr. Hemîd Bozerslan” ve hate lidarxistin û pêk hatibû ji avakerê Cibheya Millî Dêموکراتîk a Îranê, “Hidayet Metîn Defterî”, Fotografîst “Rîza Dîqetî” û parêzer û çalakvanê Mafê Mîrov, “Ebdulkerîm Lahîcî”.

Panêla çarem jî, ji aliyê “Dr. Kendal Nezan” ve bi rê ve çû, ku bo kesên bîhanî hatibû terxankirin, ku ew jî pêk hatibûn ji nivîskar û şarezayê Jêopolîtîk “Jêrar Şaliyan”, berpîrsê berê yê sekretariyeta navnetewî a Partiya Sosyalîst a Feransê Alên Şanêl, Rojnamenivîsê “Mond”ê Firoşon, Wezîrê Karûbarê Derve yê berê yê Feransê Bîrnard Koşnêr, Rojnamevan Mark Kirowêtz, Nivîskarê pirtûka biyografiya Dr. Qasimlo Karol Pronhobêr, rojnamevan Canatan Randal, û berpîrsê berê yê Saziya Pizîşkî a “Amî” wate Alîkariyê Pizîşkên Navnetwî Dr. Florans Wêbêr”.

Herwisa cihê baskirinê ye, ku cihgirê yekem yê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Hesên Şerefî”, digel çendîn kesayetiyên bîhanî û herwisa Kurd û Îranî hevdiîtin pêk anî.

Sergotar

Nansnameya hebûnê

N: Kerîm Perwîzî

Hekî tu dixwazî kesekî bikî kole, û bi tepeserkirinê ji behreya kar û jiyana wî mifahê werbigrî, û bi hêza xwe wî teslîmê îradeya xwe bikî, eva yasaya sedeyên derbasbûyî bû û di sedeya niha de jî ji bo kolekirina mirovan herçiqas ji gefan jî mifahê werdigrin, lê zêdetir ji pare mifahê werdigrin, û pere û darayî, kirine amrazik bo kolekirin û tepesekirina mirovan.

Lê hekî tu dixwazî kesekî wisa lê bikî ku bi dil û daxwaza xwe koletiyê hîlbijêre û heya dawîya jiyana xwe koletiyê bo te bike, mêjiyê wî dagîr bike! Eve remza koletiya hertimî ye ku kesek bi dilê xwe bi bê ti nerizayetiyeke teslîmê îradeya kesekî/e din be, û gellek caran jî şanaziyê bi koletiya xwe ve dike û singê xwe dide pêş ku min axayeke wiha heye!

Cora yekem a koletiyê, koletî bi neçarî û bi zorî ye û her eva ku hêza tepeserî lawaz bû, hekî nan û pare kêmbibe kole jî şoreşê dike û nerizayetiyeke xwe nîşan dide. Yan jî hekî rewşek bo kole bête pêş, kole radibe ser xwe û bi çendîn serhildanan li dijî şemkaran xwenîşandan dikan. Lê koletiya cureya duyem, koletiyêke kûrtir e û bi mêjiyê xwe bawerî bi kolebûnê aniye, û ti biyaveke din ji bilî axa û koletiyê nabîne, û bi dilê xwe zincîra koletiyê avêtiye stuyê xwe û qahîm dike.

Cora sêyem a koletiyê jî heye, ku ji van cureyan jî tûndtir e, eve jî dagîrkirina şunas û guherîna ziman e. ziman emrazê bîrkirinê ye, û mikanîzma birêkxistina mêjî û çavê mêzekirin û guhê bihîstin û seha famkirina cîhanê ye, ku bi wane re cîhana

Dezageha Perwerde û Lêkolînê pêncemîn dewra asata du û beşa yekem lidar xist



Sibêdeha roja Duşemî 21'ê Rêbendanê, di rêûresmekê de Dezgeha Perwerde û Lêkolîneve dawî bi dewreyekî din a asta 2 û beşa yekem anî.

Rêûresim bi sirûda netewî a “Ey Reqîb” û sekîndandina xûlek bédengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdiştne dest pêkir.

Piştî Endamê Hey'eta Îcrayî a Navenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê “Luqman Mêhfer”, çend gotinek pêşkêş amadebûyan kir.

“Luqman Mêhfer” di destpêka axaftina xwe de tevî pîrozbahiya amadebûyên dewra asta 2 û beşa yek, basek li ser girîngiya perwerde di nav Partiya Demokrat de kir.

Navbirî basa wê hindê kir, ku Partiya Demokrat her li destpêka avabûna wê ye û di serdemê Komara Kurdiştanê de girîngî bi perwerde daye, her di vê serdemê de bo şandina desteyek li endamê Hizbê bo Bako li Azerbaycan a Yekîyetiya soviyet hewl dabû ku komek ji kadrê tégihîştî û pêgihîştî perwerde bike ku bikare xizmetê bi Komara Kurdiştanê û xelkê Kurd bike, û herwisa bas li lidar xistina dewreyên kadrî kir ku li dehika 30 bi hewla “Dr. Qasimlo” bi rê ve diçûn.

Herwisa navbirî basa vê yekê kir ku, piştî serketina şoreşa gelên Îranê û destpêkirina tekoşîna eşkere a PDKÎ, Partiya Demokrat bi dehan dewre di astê cîhanê de bi rê ve biriye û eve

jî nîşaneyê girîngî pêdana Partiya Demokrat bi pîrsa perwerdê ye. Navbirî di berdewamiya axavtinê xwe de got: “Kadr dibe bawer bi xebûn hebe, peyrewîkirin li biryar û biryardan, dadperwerbûn, bilindkirina asta zaniyariyan, kadr dibe bijarteyê Hizb û civatgehê be, rêz ji xelkê bigre û kadr dahata me'newî û madî a rêkxistinê ye.

Piştî axavtina “Luqman Mêhfer”, peyama Dezgeha Perwerde û Lêkolîneve, ji aliyê “Ubeyid Muradî” pirsînêlê dezgeha Perwerdê ve hate xwandin û piştî jî, peyama amadebûyên dewra asta 2 û beşa yek ji aliyê beşdarbûyî dewrê “Mihemed Nubarî” ve hate xwandin.

Di beşa dawîya rêûresmê de kesên yekem heya sêyem ên vê dewrê ji aliyê “Luqman Mêhfer” ve hatine xelatkirin. Ev kesên ku di vê dewrê de serkevtina sata yekem heya sêyem bideşt anîn wiha ne: “Saman Seyîd Ehmedî, Hîsam Silêmanî”, Tahîre Rehîmîzade”.

Cihê baskirinê ye ku, ev dewra siyasî a pêşmerge, li rêketa 7'ê Befranbar a 1398'an dest pêkir û heya rêketa 20'ê Rêbendan a 1398'an dom hebû ku di wê heyamê de 12 wane hatine pêşkêşkirin.

derdora xwe nas dike, û pênaseya hebûna xwe dike. Ziman tenê pêk nehatiye ji

çend deng, pît, yasaya hevgirêdana pît û rêzkerina peyvan, belkî pêkhatiya mejî û hizr û mêzekirinê ye, û her ji bo vê jî di zimanên cuda de cîhan bi cureke din tê mêzekirin. Kultûra coxrafîyaya zimanê Îngilîzî digel kultûra Feransewî, dinyayekê cudayî heye û hekî bi Farsî diaxivî, mirov seh-eke din heye û hekî mirov bi Kurdî dipeyve, cîhanê cureyeke din dibîne.

Hekî kolebûna mêjî bi ser kesekî/e de zal be, herçiqas koletiyêke bîngêhî bûye, û egera hişyarbûna tak kêmbê, lê bi guherîna dem û rewşê, hekî hişyarî bigihîje mêjiyê wî/e kesê kole, renga ew li dijî zincîrên destçêkirî ên mêjiyê xwe rabe ser xwe û serhildanê bike. Lê hekî tu zimanê kesekî/e dagîr bikî, te amrazê agehbûna wî jê şandiye.

Lê hekî tu zimanê kesekî/e dagîr bikî, wê demê te emrazên hişyarbûnê jî, jê şandiye, lewra koletî di asta dagîrkirina ziman de, koletiyêke rehştûrtir û gellek kûrtir e ku kolonyalîzma tîkel bi şowênîzmê, dixwaze zimanê neteweyên jêrdset asimîle bike, û zimanê xwe bike nav mêjiyê wan de. Di rastî de şowênîzma zal dixwaze nasnamebûna netewa me bihelîne, û pênaseyeke destêşkirî bike ber wan de, da ku bo hertimî wan bikin koleyên xwe.

Emê zimanê xwe yê Kurdî biparêzin û berfirehtir bikin, çimkî zimanê daykî nasnameya hebûna me ye, û her ji bo wê jî, em bi hemû awayekî berevaniyê ji wê nasnameyê dikan.

Peyama lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bo simînara Dr. Qasimlo li Parîsê

Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bo simînarekê ku taybet bi Dr. Qasimlo li Parîsê bi rê ve çû, peyamek belav kir, ku di vê peyamê de bas ji kesayetî û siyaseta Dr. Qasimlo hatiye kirin ku çawa Dr. Qasimlo sîma û rengûrûyeke nû bexşî PDKÎ.

Deqa peyamê weha ye:

Di salên dawîya dehka 60 a Zayînî de, dema ku Dr. Qasimlo ji Ewropa vejeriya Ewropayê nav hevalên hizbî li Kurdiştana Başûr, ji bilî çend kesan di vê beşê de, kesên wisa li dewra hizbê nemabûn. Hejmareke berçav ji endamên PDKÎ di tevgera çekdarî ya sala 1967-1968-an de, û li dema berberekanîya digel hêzên rejîma Paşatiyê di navxwe ya Kurdiştana Rojhelat de şehîd bibûn, û di gel komeke kêşeyên teşkilatî û rêxiraweyî berbirû bibûn, û aştî pêwendîya rêxistinî digel aliyê Rojhelat gihîştibû aştî xwe ya herî kêr. Kêşeyêke din jî ew bû ku pêwendiyek bi wateya teşkilatî di nava wan kesan de nemabû.

Lê vejeriyana Dr. Qasimlo ji Ewropayê, û şewaza birêveberîya wî, rengûrûyeke nû bexşî PDKÎ. Şewaza xwendinê, şîyan û şarezaiya di rêxistin û organîzekirinê de bûye sedema vê ku bikare yekem car pişka zêde ya wan kesan ku bi her sedemekê ji hizbê dûr ketibûn, rêk bixe, û organizasiyoneke serûbertir pêk bîne, rojnameyek ku weşana bîr û hizra PDKÎ bû, ser ji nû çap û belav bike, û pêwendiyên vê hizbê bi şewazeke îroyî ava bike.

Pêngava herî girîng a Dr. Qasimlo di van serdeman de, nivîsandina bername û pêrewa navxwe a hizbê bû, ku hevdem di PDKÎ de bîhanî bû. Her di vir de bû ku çawanîya pêkanîna civînên girîng ên hizbê wek konferans û kongireyê, darêtina siyasîyên giştî, taktîk û stratejî û gellek mijarên pêwendîdar bi karûbarê Hizbî bi şeweyeke



serdemiyane hate gelalekirin, û di konferansa sêyem a hizbê de hate pesendkirin.

Ji wê demê şûnda heya dema şehîdkirina bi destên dîplomat-terorîstên Komara Îslamiya Îranê li rêkewt 13.07.1989-an de, Dr. Qasimlo hemû hêz û şîyana xwe bona bihêzkirina PDKÎ di hemû warên pêşmergeyê, rêxistin, û aborî de bi kar anî, bi taybetî ku bingeheke bihêz a siyasî û hizrî bo pêwendiyên hizbê digel welatên herêmê û rojavayî darêt. Li ser vê bingehe bû ku pênasîyeke rohn, û dîtingeheke bê girê bo mijara dostatî, berjewendî, hevpeymanî, serbixweyîya siyasî û pîrensîpa girêdana pêwendîya bi hizbê û aliyan û welatan anî ber bas.

Dr. Qasimlo di qonaxa şerê sar û hevkêşeyên cîhana duserî de cîhanbîniya taybet bi xwe hebû. Berfirehbînî û nîrxandina hûr û hemûaliyane li deqa rikeberîyan û rewta bûyeran, taybetmendiyeke bêhempa ya vî rêberî bû.

Vejiyana PDKÎ di vê qonaxê de, û rabûna ser piyan di rastî de, vedigere ser jêhatîbûn, û zanişt û şîyanên Dr. Qasimlo li mijara birêveberî û rêxistin û rêberîkirinê de. Dr. Qasimlo çî wekî bîrmendeke siyasî û çî jî kesayetiyeke akademî, çî wek rêber û karereke neteweyî û çî jî wek sekreterê PDKÎ bi sedema vê taybetmendîya ku hebû,

rêxereke jêhatî û bêhempa bû.

Ji vê dîtingehê ve dema ku em li kesayetiya Dr. Qasimlo wekî kesekî rêxer dinîhêrin, dibe ku em bala xwe bidin çend xalan. Dr. Qasimlo ne tenê di aştî hizba xwe de rêxereke meydanî ya bi tewahiya watayê bû, heta di bazîneyeke berfirehtir de û di aştî Kurdiştanî û opozisyona Îranî de, ew aliya jî kesayetiya wî bi eşkere derdikeve.

Her wekî ku min îşare pê kir, Dr. Qasimlo wekî bîrmendeke, pêvajoyên hizrî û teoriyên bibandor ên cîhanê nas dikirin, û bala xwe dida wan. Di rikeberiyên wê serdemê de yek ji karên binîrx ên wî ku zêdetir bi armanca sînorbendiyê anî gorê, dariştina “Sîmaya Demokrat” bû.

Dr. Qasimlo û xalên “Sîmaya Demokrat” wekî pîrensîpên endamekî/e hizbê darêt, ku dibe watayê bide bîrkirin û reftar û kirdara her takekî/ê.

Wî jêve bû ku Demokrat ji girêdayîbûnê bêzar e, û demokrat nasyonalîsteke berçavteng nine, Demokrat bo nehêlana sîema neteweyî xebatê dike, Demokrat bawerî bi resaleta dîrokî ya PDKÎ heye. Hekî em dîna xwe bidin naweroka deq û gotar û gotûbêj û daxuyaniyên wî, ji me re îsbat dibe ku şewaza karê rêxistinî ê Dr. Qasimlo gotartewer bû, bi wateya gotareke demokrtaîk û şoreşgerane û hevdem nûx-

wazane, ku encama wê bibe perwerdekirina tak wate kadr, pêşmerge, endam û aligirên hizba xwe. Wateya berfirehtir ya vê perwerdehiyê ew bû ku hewleke hemû aliyanê dida, da ku tevgera neteweyî ya Kurd li Kurdiştana Rojhelat, di rewşa demokrasiyê nederkeve û “sîmaya demokratîk” ya tevgerê paraştî bimîne.

Di aştî Kurdiştanê de jî, Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku hemû hizb û aliyên siyasî ên Kurdiştanê li hemberî pîrsa neteweyî de berpirsyariya hevpar hebûne, dîtingeheke exlaqî bi wateya bawerdarbûna bi pîrensîpên xebateke rewşa. Cuda ji qada gotara wî, qada piraktîkê ya Dr. Qasimlo nîşanderê siyaseta rastbînane û rengûrûyê piragmatîstî ya Dr. Qasimlo bû. Di vê derheqê de ku berdewam di hizra sazdana hevpeymaniyê û yekxistina hêzên dijber ên Komara Îslamî bû.

Dr. Qasimlo gellek hewl da ku di nava rêxirawên opozisyona Îranî ku di van salan de, di navxwe ya Îranê de bûn, û carê neketibûne ber xezêba siyaseta serkutkarane ya rejîmê, hevpeymanî û yekîtiyekê pêk bîne, bo vê meremê digel gellek ji wan pêwendî girt û amadekariya vê jî kir, ku PDKÎ li bajarê Mehabadê wan kom bike, û bi pilatformeke diyarîkirî bo xebat li dijî rejîma Komara Îslamî wan organîze bike. Lê rejîm ku agehdarî van hewlan bû, êrîş kire ser Mehabadê. PDKÎ jî bona vê ku xelkê bajar nehêne kuştin, biryar da ku hêza pêşmerge ji bajar vekişîne, di encam de hêzên rejîmê Mehabad girtin, û bi vî rengî civîn ser negirt.

Piştî jî heta wan demên ku wekî serdan diçû Ewropayê, hemû derfetek bo yekrêziya opozisyona Îranî vediguhaşt, heta di dawiyê de “Şoraya

»»»Doma R:3

Millî ya Muqawimet” li dervey welat pêk hat, ew şêvra, ji komeke alî û kesayetî û rêkxirawên opozisyona Îranî pêk hatibû, ji wan Mucahidînê Xelq û Benî Sedr, ku ji serkomariyê hatib avêtin, û xwe gehandibû Parîsê. Herweha PDKÎ ku endameke çalak a vê şêvrê bû, lê mixabin ew hevpeymanetî jî bi sedema kêşeyên navxweyî, û yek ji wan kêşeyan, xwe wekî mêhwerzanîn û reftara nedemokratîk ya Mucahidînê, piştî çend salan hilweşiya.

Dr. Qasimlo her bi vê redeyê ku di xebata li dijî Komara Îslamî de cidî û bibawer bû, her bi vê redeye jî bawerî bi çareserkirina aştiyane ya pirsê Kurd hebû. Di vê derheqê de, û di 20-ê Sermaweza sala 1358-an a Rojî de, bi tekoşîna Dr. Qasimlo û bi beşdariya heyetekê, Deştaya Nûneratiya Gelê Kurd li Mehabadê pêk hat.

Vê heyetê çendîn hizbên Kurdî û xeyrî Kurdî bi xwe ve digrtin, û bi hev re digel rejîmê deşt kirin bi gotûbêjan. Gotûbêj bo heyama çend mehan berdewam bûn, û di vê heyamê de çend caran heyeta hikûmetê digel Heyeta Nûnertiya Gelê Kurd ku Dr. Qasimlo berdevkê wê bû, civîn hebûn, lê rejîmê wê demê gellek riyakarane rewşa agirbes û gotûbêjan di berjewendiya xwe de bi kar anî, û hêza şîrr a xwe rêk xist, û êrîş kire ser bajarê Mehabadê û herêmên di bin deshîlata hêzên Kurdî de.

Piştî bi salan rejîm ku di cewherê xwe de li dijî beha û nîrx û van têgehên e, ku bawerî pê hebû, carek din pîrensîpa aşîxwazane a Dr. Qasimlo wekî derfetekê bi kar anî. Di bin navê gotûbêjê de pîlana terorkirina fîzîkî bo darêt, û navbirî tevî Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî û berpirsê ofîsa nûnertiya PDKÎ li Parîsê li 13.07.1989-an de şehîd kirin.

Di raştî de Dr. Qasimlo

paşxaneke hizrî û siyasî ya wisa jê bi cih maye, ku ji bo me di nava PDKÎ de û ji bo tevgera neteweyî-demokratîk a Rojhelat sermaye û remzeke nemir e.

Ez bi bîr tînim ku Dr. Qasimlo di goatrekê de bi navnîşanê terorîzm jî dîtingeheke cuda ve, ku bo konferansa “teror û rewşa mirovane” nivîsandiye, û di roja 16-ê Desambêra 1986-an de, li vir (li Parîsê) bi rê ve çû, boçûna xwe derheq terorîzmê û berbirûbûnê dixêrê.

Ji dîtingeha Dr. Qasimlo ve terorîzm hekî tê wateya êrîşa li ser jiyana azadane û xelkê bêtawan, PDKÎ li gora pîrensîpa xwe wê ret dike, û li dijî wê disekine. Bi boçûna Dr. Qasimlo nîrxandin û pênaseya Rojavayîyan bo terorîzmê ne di cihê xwe de ye, û ew yek jî xebata li dijî vê diyardeyê bîzêmet dike. Pêşniyara Dr. Qasimlo ji bo Rojavayîyan bi vî rengî bû:

“Dema vê hatiye ku em van cudahiyan bidin aliyekî, û giringiyê bidin, nîrxên jiyana mirov di Rojhelata Navîn, jiber ku nabe tenê bîr ji ewlehî û berjewendiyên xwe wek rêkarekê bikin, ew li ser vê baweriyê bû, ku dibe di warê siyasî û exlaqî de piştevaniya van tevgeran bikin, ku hawara xwe bo terore nabin û eva jî şewazeke bo berbirûbûna terorîzmê.

Niha jî ku sî sal bi ser terorkirina Dr. Qasimlo re derbaz dibe, teror pênaseyeke neguher û di kiryarê de siyaseteke fermî ya Komara Îslamî ye. Di raştî de teror bi wateya xwe ya berfireh, beşek e ji urfa siyasî û bîngeha fikrî ya vê rejîmê.

Hekî Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku dijminê yekem ê terorîzmê demokrasî ye, li ber çavên we hemiyan e, Komara Îslamî jî ekter û palpiştê yekem ê terorîzmê ye di cîhanê de. Terorîzma Komara Îslamî ne tenê ewlehî û nasnameya neteweyên Îranê û jiyana çalakan û xebatkarên opozisyona rejîma Îranê kiriyê armanc, belku mîjve ye, ku

dervey sînoran jî bi xwe ve girtiye. Vê rejîmê toreke berfireh a terorîstî di welatên herêmê û heta li Rojava jî rê xistiye.

Ya ku em li Îraq, Yemen, Sûriye û Lubnan û herêmên din ên Rojhelata Navîn dibînin, encama vê siyasetê ye. Rejîm bi pêkanîna şerê piroksî û firqeyî û damezrandin û amadekirina deyan rêkxiraw û hêzên milîşayî, ewlehî, û tenahiya herêmê ji nav biriye. Di heyama çend salên borî de di her yek ji welatan de bi dehan û sedan hezar kes bûne qurbanî û bi molyonan kesî jî awarê welatên din bûn. Bi vî awayî têçûyeke zêde a emnî, siyasî, û mirovî, bo herêmê li pey xwe hebûye û jêrxana aborî û civakî a van welatan hilweşandiye.

Ya ku wek siyaseta herêmî ya Îranê tê dîtin, dirêjkirîya siyaseta vê rejîmê ye di navxwe de. Niha Komara Îslamî ji bilî serkutê nebe, şiyana çareserîya kirîzên kelekebûyî nine. Tu deştê bendî û gotarek ku şiyana derbazkirina rejîmê ji vê binbestê hebe tune ye, û her hemû jî hatine ceribandin. Serhildana neteweyên Îranê îşreya bi vê binbestê ye.

Aliyê kêr di çend salên borî de çend pêlên nerazîbûnê û serhildanê li dijî rejîmê serî hildane, û ji zarê bepirsan ve bi erdheja siyasî hatiye şibihandin, lê bi sedema bikaranîna hêza serkutê, eva heyamek e ku hatiye vemirandin. Zêdetir ji 1500 kesî di meşên nerazîbûnê de hatin birîndarkirin, yan jî bo girtîgehên hatin şandin, û pêla girtin û bêserûşûnkirinê heya niha jî berdewam e. Hevdem li aliyê din ê sînor û li Îraqê, serhildana bi hezaran kesî di vî welatî de, ku bi armanca derbirîna nerazîbûnê li dijî hikûmeta xwe û siyaseta deştêwerdanê a Komara Îslamî li welatên wan de serî hildaye, bi riya girûpên milîşayî ên ser bi rejîma Tehranê ve tê serkutkirin, û heman çarenûsa xelkê serhildêr ê Îranê bûye para wan.

Digel vê ku cewherê dijîmîrovî a Komara Îslamî ji

bo hemû aliyekî rohn e, lê mijara berjewendiyan weha kiriyê ku hejmarek ji welatên Rojava vê raştîyê berçav negrin. Di demekê de ku tekoşînê dîkin mîkanîzmekê bibînin ji bo derbazbûna rejîmê ji kempeyna zext û givaş û dorpêçên Amerîkayê, rejîm berevajî di van welatan de, mijûlî darêtina pîlanên terorîstî ye.

Di vê qonaxa heştîyar de ku komdengiyek li dijî siyastên navçeyî ên Îranê pêk hatiye, û neteweyên Îranî li dijî wê rejîmê rabûne ser piyan, pêkanîna hevalbendiyeke cîhanî li hemberî vê rejîmê hewcehiyeke dîrokî ye.

Herwek çawa hevpeymaniya navneteweyî li dijî DAÎŞ-ê pêk hat, hewce ye ku hevpeymaniyeke bihêz li dijî terorîzma dewletî ya rejîma Îranê jî bê pêkanîn, û alîkariya xelkê serhildêr ê Îranê bê kirin, bona ramalîna vê rejîmê.

Bêguman tenê di nemana Komara Îslamî ya Îranê de ye, ku çê dibe mirov bixêrhatineke mirovatiyê bo serdema aşî û aramiyê li herêmê de bike.

Herweha niha demeke baş e, bona vê ku dewleta Otrîşê (Nemsayê) dosiyeya terorkirina Dr. Qasimlo li Vîyenê de bixê ger, û bi vî rengî ji aliyekî ve cubrana kiryarên neyasayî û naexlaqî ên şandina terorîstên Îranî ên vê bûyerê bo Tehranê bi bê dadgehîkirin bike, ku xwaşteke sereke ya Kurd bi gîştî û PDKÎ bi taybetî ye, û ji aliyekî din ve jî vê riyê ve, zext û givaşên li ser rejîma Komara Îslamî zêdetir bike.

Yad û bîra Dr. Qasimlo jî, wekî hemû ewên ku di riya azadî û jiyandostî û dabînkirina mafên neteweyî û demokratîk de bûne qurbanîyê terorîzma dewletî ya Komara Îslamî, bilind û heta-hetayî be. Ji aliyê rêberatiya PDKÎ hizba Dr. Qasimlo ve, em spasiya xwe pêşkêşî enstîtûya Kurd li Parîsê, bi taybetî Dr. Kendal Nezan dîkin, bo pêkanîna vê bîranînê. Herweha spas bo we heval û hevbîrên Dr. Qasimlo

Navenda Hevkarî tekezî li ser baykota hîlbijartinê kir

Semînarek li welatê Sû'îdê, bi deşpêşxerîya Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê, di derheq baykotkirina hîlbijartinên Îranê de hate lidarxistin û tekezî li ser beşdarînekirina xelkê li şanoya hîlbihartina rejîmê kir.

Roja Yekşemî, 27'ê Rêben-danê, semînareke siyayî bi deşpêşxerîya "Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê" li bajarê "Stokholm", bi merema rohnkirin û hişyarkirina xelkê li hîlbijartinê dewreya Yazdehem a meclîsa Şevraya Îslamî a Îranê bi rê ve çû.

Di vê semînarê de, bi amadebûn nûnerên her çar Partiyên û komek ji mêvanan bi rê ve çû, aliyan tekezî di ser narohniya dengdan li sîstema rejîma Îranê de kirin ku bi bê vê ku bawerîya wê bi hîlbijartinê hebe û girîngiyê bi mafê hevvelatîyan bide, wekî, emrazekî bi wergirtina rewatiya xwe hewil dide bi fêl û nemaze gef, xelkê di wê hîlbijartinê de amade bike. Di wê semînarê de basa vê yekê hate kirin ku, rejîmê ji wê rêyê ve dixwaze bi cîhanê îsbat bike ku hîlbijartin di Komara Îslamî de heye û xelk azad in çî tiştê hîlbijartinê.



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

jêrin.

Di wê panêlê de her yek ji nûnerên çar Partiyên Navenda Hevkarî, her yekê ji dîdgahekê ve avirên xwe bo beşdarînekirina xelkê li bi nav hîlbijartinê dubare kir û daxwaz ji xelkê Kurdistanê kirin ku di wiha hîlbijartinekê de ku qazanceke bo rejîmê ye, amade nebin. "Çiya Elîyar" bi nûneratiya PDKÎ di vê semînarê de amade bû.

Navbirî di axavtinê xwe de, tevî îşarekirin bi nede-mokratîkbûna hîlbijartin li sîstema daxistî a rejîmê de, basa wê hindê kir ku rejîma

Îranê ti derfetek nehêlaye ku xelk ji wê rê yê ve daxwazên xwe misoger bike.

"Elîyar" got: "Hevdem nûnerên meclîsê hekî li hemû filterên ewlehî jî derbas bibin, lê selahiyet û dethilateke wisa ninin ku hinek yasayan bipejirînin ku di qazanca xelkê de be, çimkî Şevra Nîgehban û Şevra Kultûrî û Kora Diyarîkirina Berjwendiyên Nîzamê red dikin". Navbirî di berdewamiya axavtinê xwe de got: "Rêformxwaz bi berdewamî Spahî mana rejîmê bûn û di dema kirîza navxweyî û derve de havara rejîmê de çûn, lê wê carê di xwenîşandanan de

me dît ku xelkê silogan li dijî tewawîya rejîma Komara Îslamî a Îranê didan û hawar dikirin (Îslah Teleb, Isolgera dîger temqam Eşt), eve jî wisa li rejîma axûndî kir ku çiyê din nekare, xelkê bi rîforîmxwazan ve bixapîne.

Navbirî di parek ji gotinên xwe de îşare bi siyaseta diruşt û bikêrhatî a PDKÎ kir ku li deşpêka hatina ser kar a wê rejîmê bi berhevdanîneke diruşt û bikêrhatî baykota hîlbijartin a rejîmê kiriye û (NA) bi Komara Îslamî li tewawîya xwe de gotiye, ku cihê kêfxweşiyê ye îro parek li opozisiyonên Îranê û heta Rêformxwaz jî, hatine ser wê bawerê ku Partiya Demokrat û gelî Kurd hebûne.

Di beşa du a wê semînarê de beşdariyên semînarê, tîbînî û pirsyar araştêyê nûnerên Partiyên amade kirin ku bersiva wan hate danê.

Di dawîya semînarê de careke din nûnerên amade li Navenda Hevkarî, tekezî li ser baykota bi nav hîlbijartinê rejîma Komara Îslamî a Îranê û daxwaz kirin ku (NA) bi wê deşhilatê û nîzamê bêjin ku bûye cihê kirîzê, lê bo jiyana hevvelatîyên xwe.

Îraq û Herêma Kurdistanê ji tîrsa tûşbûna vîrûsa Kironayê, derwazên sinorî yên xwe digel Îranê dadixin

Wezareta Tendurîstî ya Herêma Kurdistanê daxwaz li Wezareta Navxwe kir, ku rêgiriye li hatina hevvelatîyên Îranê bike bo nav Herêma Kurdistanê, Wezîrê Tendurîstî yê Herêma Kurdistanê Saman Berzincî, di Nameyekê de, daxwaz ji Wezareta Navxwe kir ku rêgirî li hevvelatîyên Îranê bê kirin ku nekevin Herêma Kurdistanê.

Wezareta tendurîstî ya Îraqê daxwaz ji hikûmetê dike deriyên sinorî digel Îranê dabixe, lewma Îraqê hemû deriyên sinorî yên digel Îranê girtin û ji ber Kironayê geştên asmanî bo Îranê rawestandin.

Di daxuyaniyekê de, Wezareta Tendurîstî ya Îraqê, daxwaz ji hikûmeta Bexdayê kirî ye, li ber egera gihîştina vîrûsa Kironayê ji Îranê ve bo Îraqê, tewaya rêyên geştîkirin û serdankirinê di navbera Îraq û Îranê de dabixe, tenê şandên dîplomasî nebe, ew jî bi wê mercê ku pişkinîna pîzîşkî bo wan bêtekirin û ji encama pişkinîna xatircem bin.

Di daxuyaniya Wezareta Tendurîstî ya Îraqê de hatiye, sedem belavbûna vîrûsa Kironayê li Îranê ye, ku bi sedema wê hejmarek haletên mirinê û tûşbûnê bi wî derdî hatîne tomarkirin.



Mirina 4 kesan li Qaumê û kesek jî li Erakê bi vîrûsa Kironayê hatiye piştraştîkirin.

Navenda Hevkarî bi hilkefta roja cîhanî a Zimanê Zikmakî semînarek lidar xist

Komîteya Ziman û Kultûr a Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistan Îranê, semînarek bi hilkefta 2'ê Reşemeh roja cîhanî a Zimanê Zikmakî lidar xist.

Roja Çarşemî, 30'ê Rêben-danê, Komîteya Ziman û Kultûr a Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistan Îranê, semînarek bi hilkefta 2'ê reşemeh, roja cîhanî a Zimanê Zikmakî li bajarê Koye bi amadebûna dehan kes ji xelk û endamên Partiyên Navenda Hevkarî û nûnerên Part û alî û kesên nîştimanperwer bi rê ve çû. Ew semînare, piştî sekînan-dina xûlek bêdengî ji bo rêz-girtin ji canê paqij ê şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê, deşt pêkir.

Ew semînare li 3 panêlan pêk hatibû.

Di panela yekem de “Dr. Hejar Rehîmî”, mamosteyê zanîngehê basek li ser girîngî û pêgeha ziman di binyata şoreş û bawerbixwebûna netewî de pêşkêş kir. Rehîm di parek ji axavtinên xwe de got: “Bi xweşî ve



niha zimanê Kurdî mijûl e bi hêzeke mezine ve diçe nav meydana zanişt, nasîn û destewajeya felsefîyan û em dikarin bêjin ev hinde bihêz bûye ku êdî gefa jinavçûnê li ser nemaye. Me bo xwe zimanêke bihêz a xwediyê şiyana berhemana hîzrî û felsefeyî heye, her ji bo vê jî hewldan bo sivikirina zimanê netewa baladeşt di Îranê de ne hewceye û ne dikare ti alîkariya me bike bo vê ku

weqetiyana nasnameyê bo me berhem bîne”. Di panêla Duyem de “Resûl Sultanî”, helbestvan û wergêr, basek li ser cih û bin-yata ziman li xebat û milmi-laniya dîroka di navbera netewa Kurd û dagîrkerên Kurdistanê de pêşkêş kir. “Sultanî” di destpêkê de got: “Ziman hemû fakterên şûnasê di xwe de kom dike û heta girîngiya ziman di pirtûkên Ola Îslam û Mesîh-

ityan de tekezî li ser hatiye kirin. Ew neteweyên ku di meşa dîrokê de zimanê xwe di hember zimanê dagîrkeran de peyda kirine, nasname û serweriya nîştimana xwe jî peyda kirine”.

Di panêla Sêyem û di dawiyê de, “Dr. Rehîm Surxî”, mamosteyê zanîngehê, ji rêya Skayipê ve basek li ser girîngiya perwerde bi zimanê zikmakî li ser kesayetiya tak û civatgehê pêşkêş amadebûyan kir.

“Surxî, tevî basek li ser çewtekariyên rejîma Îranê bo nîşandana azadiya zimanê Kurdî di Îranê de, ragihand: “Armanç li wê derfetên kêmkirina Komara Îslamî bi zimanê Kurdî dide, bê mifah kirina zimanê Kurdî û ji ber çavê xelkê wê bê hêz nîşandan dide”.

Semînara Komîteya Ziman û Kultûr a Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistan Îranê, piştî demjimêr û nîvekê û pêşkêşkirina Sê panêlên Zanîştî a pir wate, piştî nîvroya roja Çarşemî 30'ê Rêben-danê dawî pêhat.

Pizîşkîya Yasayî di nameyekê de amara qurbanîyên meha Xezelwerê eşkere kir

Eşkrebûna nama bi dizî ve a Pizîşkîya Yasayî ya rejîmê bo Dezgeha Dadwerî ya rejîmê li derheq kuştîyên xwenîşandana meha Xezelwerê di Îranê de.

Eve heyamê 3 mehan e li ser kuştar û tepeseriya bê rehma-ne a xwenîşandana xelkê Îranê re derbas dibe, ku li heyamê çend rojan de, hêzên rejîmê bi biryara Xamineyî hezaran kes bi awayekî hovane kuştin û hezaran kes biçav kirin, heya niha jî rejîm amade nebûye amara qurbanîyan bi awayê fermî rabigihîne.

Pêka hinek raporên nefermî ku texmîn hatibû lêdan, renga heya 1500 kesî hatibe kuştin.

Rêjîmê gelek baş dizanî ku

komkujî û tepeseriya bi xwîn a meha Xezelwerê hinde mezin û hovane bûye, ku hekî xelk bizane, dê cîhanê de deng bide.

Niha nameyeke bi dizî ve ya Pizîşkîya Yasayî ya rejîmê bo Îbrahîm Re'îsî Serokê Dezgeha Dad a rejîmê li ser torên civakî deşt bi deşt dibe ku faci'eya meha Xezelwerê bi xwîn dide xûyakirin, di parek ji wê name de hatiye: Pitir ji 4811 cinaze di 14 serdxanan de ne, ku pêka biryara Şevra Bilind a Tenahî ya Netewî a Welat ku dabû zanîn, me îzna dana cinazan bi malbatên wan re nîne. Di wê namê de hatiye ku cinazê 119 kes ji hêzên rejîmê jî di serdxanan de ne.

Pizîşkîya Yasayî di nama xwe



de bas ji egera nerizayetiya malbatên kuştîyan dike, ku cinazê piraniya kuştîyan bi hegera xendiqandin, bêsêrûber kirina laş, derbên qeme û kêran û avêtina ji bînayên bilind re. Lewma nikarin cinazan teslîmî malbatên wan bikin.

Pizîşkîya Yasayî daxwaza îznê ji Dezgeha Dadê dike ku wan cinazan di gorên bikom de weşêrin.

Nerîna Lîderan



Mike Pompeo:

“Xamineyî ji hemû tiştêkê zêdetir ji hilbijartina azad ditirse”.



Nêçîrvan Barzanî:

“Divê civaka navdewletî metirsiya serîhildana DAIŞê micid bigire”.



Faisal bin Farhan:

“Dibe gefên li ser Îranê, heya dawîpêanîna midaxileya Îranê di deverê de berdewam bin”.



Mihemedcewad Zerîf:

“Amerîka digel Erebiştan û Îsraîlê, derfet nedane Îranê ku heyama tevlibûna Îranê bi “FATF”ê re dom hebe”.

Hûn me ditepisînin lewma em deng nadin!



N: Eskender Ceiferî

Li Îranê û Kurdiştana Rojhilat hilbijartinên Meclîsa Îslamî a rejîmê hatin emcandan. Her 4 aliyên Kurdî, ew hilbijartine baykot kiribûn. Take aliyê ku beşdar bû Eniya Yekgirtiya Kurd bû ku dengê xwe jî da reformxwazan û kesên ji tevgera Hesen Rûhanî. Ew rêxistin, di nav xwe de rastî pirsgrêkan hatiye. Di nav xelkê de jî qet alîgirên wan nîn e û weke eniyek di çepera rejîmê de tê binavkirin. Du salan beriya niha Hamîd Ferazî yek ji serkirdeyên wê rêxistinê dev ji wê berdabû û pişt re ev rêxistin rastî pirsgrêkan hat. Ferazî di nameya xwe de li ser devjîkarberdanê daxuyandibû ku gelek ji endamên rêveberiya vê rêxistinê tenê ji bo nîşandana navê xwe bûne rêveber û karekî bi nîrx ji Kurdan re nakin. Herwisa got ku ew tenê di heyamên nêzîkî hilbijartinan de tevgerên xwe zêde dikin û Ferazî vî karî, weke helwesteke baş nabîne. Got jî ew êdî dev ji eniya Yekgirtiya Kurd berdide bila kesên ku mîna wî nafîkirin, bikarin di rêbaza xwe de serkeftî bin.

Ev jî şikesta rejîmê û berî her tiştî şikesta reformxwazên rejîmê li Kurdiştanê nîşan dide.

Rast e ku rejîma Komara Îslamî, hemû wan berendam qebûl dike û kîjan ji wan derkeve, ji wan re ferqê nake. Lê ew di nav xwe de jî rastî pirsgrêk û aloziyan hatine. Malper û ragihandinên girêdayî Sipaha Pasdaran, qet piştî alîgirên Rûhanî nagirin. Hatiye bîra wan ku birayekî Rûhanî 40 salan beriya niha erdek bê pere ji dewletê standiye û vê mijarê weke mînaka bikaranîna milkên giştî ji aliyê malbata



Rûhanî ve bi kar tînin. Belkî wan ji bîr kiribe ku her yek ji berendamên din jî weke berendamên alîgirê Rûhanî dema ku rêveberê saziyekê bûne, berîk tijî kirine û pişt re carna dosyeyên gendeliyê li hemberî wan bûne doz.

Çalakvanên ku hin tundtir in, dibêjin rejîma Komara Îslamî tenê dixwaze navendên dengdanê vala nebin. Ew behsa daxuyaniya Elî Xamineyî rêberê rejîma Komara Îslamî dikin ku got ji min re girîng nîn e hûn dengê xwe didin kî. Tenê a girîng ev e ku hûn xwe nîşanî dujminên Komara Îslamî bidin.

Hin çalakvanên navxwe gotin ku divê Kurd deng bidin lê Cemal Azadî rojnamevanê Kurd dibêje ew kes dizanin ku Îran nikare rê li ber demokrasîyê veke lê belê berjewendiya wan di beşdariyê de ye. Cemal Azadî tekezê dike ku vê dawiyê çend hilbijartinên azadane weke ên Amerîka û Fransayê hatine encamdan. Lê ti yek ji berendamên wan, bikuj nebûn. Ew dibêje piraniya berendamên rejîma Îranê biryara kuştin, darvekirin û êrişa ser xelkê dane yan jî endamên Sipaha Pasdaran bûne ku destê wan di kuştina xelkê de hebûye ji ber ku tevahiya wan, beriya niha xwediyên postên ewlehî

bûne. Ev, nerîna gelek ji çalakvanên din ên Kurd e jî. Lê mijar li cem Farsan cuda bû û hemû Farsa hilbijartin baykot nekirin. Hin nivîskarên Fars hene ku piştî dewletê digirin û dibêjin em endamên ti partiyekê nîn in lê reformxwaz behsa mafên xelkê dikin û emê dengên xwe bidin wan. Ew herwisa behsa nasyonalîst û netewexwazan dikin û dibêjin pêwîst e ew hin guhertinan bi ser xwe de binin. Belkî mebeşt wan ji vekiribûna dewleta Rûhanî, dayîna derfeta derxistina hin heftenameyan li navçeyên cuda be. Lê wê demê divê em çavên xwe li ber qedexekirina dehan rojname, malper û belavokan di dewleta Rûhanî de bigirin ku bikarin vê gotinê bînin ziman. Ev çil sal in ku sereketirîn dujminên rejîma Tehranê, Kurd in û careke din jî wan bi hevrêziya xwe nîşan dan ku weke berê, qet baweriya wan bi rejîmê nîn e û li gor wan, take rê, guhertina rejîmê û danîna sîstemeke federal û demokratîk li vî welatî ye. Bi bangewaziya wan a 4 parityên Navenda Hevkariyê a Parityên Kurdiştana Îranê jî, careke din hate xuyakirin ku xelk guh dide deng û xwestekên wan parityan û take nûnerên Kurdan jî ew partî ne.

Girîngiya zimanê zikmakî di şunasxwaziya neteweyî de



N: Serbest Urmîye

Ziman di her serdemekê de wateyeke nû ji cîhanê dide meriv û dibe sedem ku meriv ji bedevî û nirxa jiyane, azadî, evîn, ciwanî û...hwd têbigihîje û sûdmend be.

Di civakê de, ziman yek ji herî girîngtirîn emrazên mirov e, ji têkilî û tevlibûna bi civakan û hemkûfên xwe re. Hêzek ku meriv bikare bi naskirin, nasandin û danezanîna cudahî û bedeviyan, xîmê pêşdecûn û serkevtinê darêje. Meriv dikare bêje ku ziman taybetmendiya herî bilind a mirov e. "Martin Heidegger" ê Almaniyayî, dibêje ku ziman wate jiyane û jiyane wateya xwe ji ziman werdigre.

Pêşdecûn û geşekirina civaka mirovahiye pitir ji her aliyeke din, di bin sî û bandora ziman de ye, û qonaxa herî girîng ya jiyane mirovhiye ku pitir wateya xwe ji ziman werdigire, şunasa mirov e. Di pêvajoya biçimgirtin û pêkhatina şunasa takekesî û neteweyî de, zimanê zikmakî rolekî herî berçav digêre. Zimanê zikmakî alîkar e ku meriv bikare him di warê takekesî û him jî di warê giştî û neteweyî de, çi bûn û hebûna xwe bide xuyakirin. Ji ber ku binêşeya pêkhatiya çandî û civakî ya tak, komel û netewe, zimanê zikmakî tê zanîn. Ji bo ku girîngiya zimanê zikmakî bêtir were zanîn, divêt ku em bal bikeşînin ser pîrsa şunasê (şunasa takekesî û neteweyî). Di vir de nêrînên cuda hene ku dikarin alîkarê me bin bo zêdetir şirovekirina vê pîrsê.

Di her hal de şunas tê wateya



bersiva zaniştî ya komek ji pîrsyaran li dor meriv. Yên weke kî ye û derbasbûya wî/ê çiye? Li kuderê ye û çi bûye? Ji kîjan netewe û erdekê bûye û hatiye? Xwediyê çi rol û bandorekê bûye di jiyane û pêşveçûna jiyane şariştaniyetê de û...hwd. Armanç ji derbasbûyî, derbasbûnek e ku niha jî di kesayetiya çandî û civakiya mirov de bandor heye.

Bîrmendên vî warî hizrên cuda hene derheq peydabûna şunasa mirov de. Li gor bîrmendên warê derûnnasiyê, peydabûn û derbasbûna qonaxên pey hev yên geşekirina jiyane, şunasa meriv xuya dikin. "Jean Piagete" ê Firensî û "Sigmund Schlomo Freud" ê Almaniyayî, bi bawer in ku şunas li tak ve deşt pê dike û bi derbaskirina aştên cur bi cur ên civakê digihîje aştê herî bilind ku heştê neteweyî ye.

Li gor pîsporên civaknasî jî be, şunas wate heştên ku meriv ji civakê werdigire û li ser bingeha şibhandin û cudayî yên xwe tevî komeleyên din ên civakê, pênasêya şunasa xwe dike. Wate kar û kiriyar in ku xelk û komeleyên civakî ji hev cuda dikin.

Şunas û zimanê zikmakî du pîrsên girîng û bi hev re girêdayî yên pêkhatina civaka mirovahiye ne. Bi awayekê ku vê hizrê di nava hin civaknasan de xurt dikin ku bîne ser vê baweriyê ku netewe berhema peydabûna qonaxa nûjen a jiyane mirovahiye nine, belku encama pêvajoya nûjenkirina şunasa niştîmanî ya kevnar e ku di bin bandora dîrok, kevnêşop, ziman, ol û fak-terên coxrafiyayî de ye.

Şunasa neteweyî aştê herî bilind a şunasê ye. Pêvajoya şunasxwaziyê piştî şerê yekem ê cîhanê û peydabûna sîstema navneteweyî ku welatên cîhanê bi ser çend deştêyan de parve kir, xurt bû. Ji ber girîngiya şunasa neteweyî, ev beşa şunasê weke bingeş û çavkaniya pêvajoya şunasxwaziyê tê hesibandin.

Heke qala girîngiya ziman di pîrsa şunasxwaziya neteweyî de tê kirin, hewce ye were gotin ku têkiliyên çandî weke ola hevbeş, zimanê hevbeş, wêjeya hevbeş û...hwd, têkiliyên rohî di navbera rûniştîyên welat yan herêmeke diyar a coxrafiyayî de cih dikin, reng û rûyeke siyasî û neteweyî didin wan û dibin sedem ku taybetmendiyan cuda tevî niştêcihên welatên din yan herêmên din wergirin.

Hevbeşbûn di ol, ziman, derbasbûya siyasî, hizir û nêrînên civakî, niştîmanî a siyasî, kevnêşopî û...hwd de ye, ku wateyeke seraşt didin netewe, û nasnameyeke neteweyî ji meriv re çêdikin.

Ziman ku girêdayî bi şunasa çandî, civakî û coxrafiyayî ya mirov e, hekî weke emrazê peywendiyên mirov bê zanîn, dikare were gotin ku kesê ku xwe li hember zimanê xwe de bîhanî bibîne, di hember şunasa xwe ya neteweyî de jî bîhanî ye. Ya raşt zimanê her neteweyekê bingeşa çandî û xwedî şunabûna wî neteweyî ye. Di vir de ye ku gef û êrîşên ser zimanê her neteweyekê dibe sedema hawîbûna neteweyî û nemaze di navbera nîfşa nûgihiştî de. Bi rengekê ku serbarê hawîbûn ji şunasa xwe ya neteweyî, ji zimanê xwe û renge ji axaftina bi zimanê xwe jî, hawî bin. Ewea jî di encama hewildan berdewam bo bîrûmetkirina çand û zimanê gelan de serhildide.

Hejmarek ji kolberên Kurd li sînore Newsûdê rastî teqeyê hatin

Roja Yekşemî 27`ê Rêbendanê, hejmarek ji kolberên Kurd li sînore Newsûdê a ser bi bajarê Paweyê, ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmetê ve rastî gullereşandina rasterast hatin.

Di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmî de kolberek, yê bi navê “Ehmed Sehrayî” yê temen 24 salî û kurê “Mu`imîn” xelkê gundê “Dişê” a bajarê Paweyê, canê xwe ji dest da.

Hewdem çend kolberên din yên bi navên “Ezîm Emînzade” xelkê gundê “nirwê”, “Cebare Mihemedî, Zahid Nûrî, Celal Nûrî, Şahid Edak, Resûl Hoşî, Şadman Seyîdî” xelkê gundê “Kilaş” a ser bi bajarê Ciwanroyê û “Teha Selmanî” hate birîndarkirin.

Ew kolberane bi bê agehdariya berê ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmî ve, rastî gullereşandinê hatin.

Kolberên birîndarbûyî jî, bo tedawiya pizîşkî bo navenda dermanî a Newsûdê hatine veguhaştin û piştê bo nexweşxaneya bajarê Paweyê hatine veguhaştin.

Kolberekî din bi sedema dijiwariya birîna xwe canê xwe ji dest da

Roja Duşemî, 28`ê Rêbendanê, kolberekî din yê bi navê “Şahid Edak”, xelkê gundê “Jîwar” a ser bi bajarê Hewramanê, piştî 24 demjimêran, bi sedema dijiwariya birîna xwe di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê de canê xwe ji dest da.

Ew kolberê Kurd, roja Yekşemî, 27`ê Rêbendanê, digel hejmarek ji kolberên Kurd li ser sînore Newsûdê rastî gullereşandina hêzên leşkerî yên hikûmetê hatibûn.

Di wê bûyerê de, kolberekî Kurd yê bi navê “Ehmed Sehrayî” kurê “Mu`imîn”, yê temen 24 salî û xelkê gundê “Dişê” a ser bi bajarê Paweyê, canê xwe ji dest da.

Hewdem çend kolberên din yên bi navên “Ezîm Emînzade” xelkê gundê “Nirwê”, “Cebare Mihemedî, Zahid Nûrî, Celal Nûrî, Şahid Edak, Resûl Hoşî, Şadman Seyîdî” xelkê gundê “Kilaş” a ser bi bajarê Ciwanroyê û “Teha Selmanî” hate birîndarkirin.

Di vê derheqê de, roja Duşemî, 28`ê Rêbendanê, bazariyên bajarê Paweyê bi nîşaneyê nerizayeti nîşandana xwe bo kuştin û birîndarkirina kolberan li ser sînore Newsûdê gerev girtin û daxwaza li pey ketina wê cinayetê ji rêya navendên pêwendîder re bûn.

Paşmayên gemarên derdora kempa Zêwe a bajarê Urmiyê gefê li canê welatiyan dixwe



Di derdora kempa bajarokê Zêwe a girêdayî bajarê Urmiyê de, pir bûye ji paşmayên gemar û eve jî pirsgirêkeke mezin bo welatiyên derdora wê kempê afirandiye.

Kempa bajarokê Zêwe, ku niha bûye cihê bazar û herwisa xwindingeha şevaneroj a bexşa Sîlwana jî li wir e, derdora wê kempê paşmayên gemar komê ser hev bûne û pirsgirêkeke mezin bo welatiyên wê derdorê afirandiye.

Welatiyên bajarokê Zêweyê, heya niha çendî caran serdana bajarvaniya wî bajarokê kirine ku wê arîşeyê çareser bikin, lê heya niha ne bajarvaniyê bersiva wan daye ne jî ev pirsgirêke hatiye çareserkirin.

Ew paşmayên gemar, hezaran nesaxiyan li pey xwe ve tîne û eve jî gefe li ser canê welatiyên wî bajarokê.

Nexweşxaneya Bihiştî li bajarê Urmiyê, piştî 11 salan hêj di qonaxa Fondasiyonê de maye



Projeya avakirina nexweşxana Bihiştî li bajarê Urmiyê de, piştî 11 salan, hêj di qonaxa Fondasiyon û nîvekariyê de maye û berpîrsên rejîmê jî ti girîngiyekê nadin.

Nexweşxana 450 textî a Bihiştî, li bajarê Urmiyê de piştî 11 salan hêj di qonaxa Fondasiyonê de maye û berpîrsên girêdayê wê bînayê ew piştguh avêtine.

Biryar bû ew nexweşxane, mezintirîn nexweşxaneya bajarê Urmiyê be. Di sala 1387`an de yekemîn kulînga avakirina wê projê ji aliyê zanîngeha pizîşkî a bajarê Urmiyê ve hati-bû lêdan, û zêdetir ji 20 milyard tûmen heya niha xercê wê nexweşxanê hatiye kirin, ew pereye ku ji darayîya giştî (Beytul Mal) hatiye dabînkirin, heya niha bê xwedî û wekî peykera xemsarî û gendeliya berpîrsên rejîmê tê xuya.

Cihgirê Wezîrê Rê û Bajarsazî ê rejîma Îranê, Mehmûd Mehmûdzade, daye zanîn, ku digel rejîma Sûriyê rêketine ku ji bo Sûriyê 30 hezar avahiyan ava bikin. Eve jî di halekê de ye ku, pirojeya wê nexweşxanê ku hewceye bê avedankirin, ava nakin, û berpîrsên gendel ên rejîmê tenê di fikra gendelî û dizîkirinê de ne.

Şivan Perwer: Heta dijmin me bihêz nebîne dê bi tank û topan êrişî me bike

Hunermendê navdar ê Kurd Şivan Perwer ragihand ku heta ku dijminên Kurdan wan bihêz nebîne, dê digel wan nerûne û bi tank û topên xwe êriş bike.

Hunermend û stranbêjê navdar Şivan Perwer beşdarî bultena taybet a Rojavayê Kurdistanê li Rûdawê bû û bersiva pirsên bêjerê Rûdawê Imer Kalo yên derbarê xebatên platforma hunermendên Kurd bo yeketiya netewî de da.

Şivan Perwer got: “Miletê Kurd mileteke gelek fedakar e, çi warî siyasî, hunerî yan jî civakî be amadeye xwe bide li ber. Eger kar û xebat bi awayeke rêkûpêk bimeşe miletê Kurd jê re amade ye. Gelê Kurd her tim amade ye xwe rêkbixe. Partî, tevger û hêzên siyasî ji bo gel her tim girîng in, çimkî ew paşeroja gel damezrînin. Lewma partiyek an jî tevgerê nekare xwe di nav gel de rêkbixe dê her tim di cihê xwe de bimîne û bibe lîstika dijminan.”

Bi gotina Şivan Perwer sedsala 20 bo Kurdan biêş û bi karesatan derbas kir û di destpêka sedsala 21ê de ew



miletên hatine perçiqandin ji bilî Kurdan hemû bûne xwedî statû û dewlet, lê hêj Kurd nebûne xwedî otonomî û derbarê vê yekê de got: “Bê guman em vê kêmasiyê nakin sûçên hareket û partiyên siyasî, jixwe dijminên rênade yekîtiya me. Kurdistan weke welateke biheştê ye û her tiştê wê heye û çavên dijmin her tim li ser welatê me ye. Ji aliyê din ve, çavên cîhanê jî li ser Rojhilata Navîn e, û dixwazin her tim ev herêm di nav şer de be û şerê hev bikin daku bikarin çekên xwe bifiroşin û li gor berjewendiyên xwe dîzayn bikin.”

Derbarê netewbûna Kurdan de Şivan Perwer diyar kir ku Kurdan pêvajoya netewbûnê derbas nekiriye û wiha domand: “Li ser Kurdan hêj ruhiyeta fedeolizîm û koletiyê heye û rewşa perçebûnê berdewam e. Te bivê-nevî ev

yek bandore li ser xebatên hunerî û çandî jî dike.” Hunermend Kurd destnîşan kir ku “Kurd mileteke hûnerî ye” û bi salan êşên û zehmetiyên xwe bi hûnerê aniye ziman û got: “Hunera Kurdistanê gelek dewlemend e, çawa Îraniyan bi edebiyatê û Ereban bi felsefe û Tirkan bi siyasetê xwe xurt kirine, Kurd jî bi hunerê xwe xurt kirine.”

Derbarê rewşa û xelkê Rojavayê Kurdistanê de Şivan Perwer dibêje: “Gelê Rojavayê Kurdistanê gelek fedakarî û xizmetkariya hemû parçeyên Kurdistanê kirine. Xelkê Rojavayê Kurdistanê hişyar û welatperwer e. Ev vê rewşa niha ya xirab heq nakin. Li wê derê gelê Kurd nêzikî wê yekê bû ku weke Herêma Kurdistanê bibe xwedê statûyekê, lê êriş li hemberî wan hat kirin. Vê yekê ez gelek êşandim.”

Di berdewamiya axavtina xwe de Şivan Perwer da xuyandin ku dibe hinek kes bibêjin civak bi îdeolojiyê pêtir dikarin ser bi xwe bê û ew tişteke asayî ye, lê divê ew îdeolojî nebe sedema perçebûnê û wiha domand: “Îdeolojî ji bo xizmeta gel û welatan e, lê eger îdeolojî millet perçe bike, ew ne îdeolojîyeke baş e. Ji ber wê em dibêjin divê hemû îdeolijiyên Kurdan divê netewî û Kurdistanî bin. Li ser vê yekê divê hunermend jî netewî bin.”

Perwer da zanîn ku ev heyameke dirêj e wan dixwest hêzên li Rojavayê Kurdistanê yekîtiya xwe çêkin, bi gotina wî kenê dijmenên Kurdan derfet û wê hêzê bi xwe re bibîne dê êrişê Kurdan bike û ew dibêje: “Eger Kurdan yekîtiya xwe çêkiri-ban dê îro bihêztir dibûn. Madem bandora hunerê li ser gelê Kurd heye, em hunermend çima dest xwe nedin hev û xizmeta milletê xwe nekin. Îro Rojavayê Kurdistanê di rewşeke gelek teng de ye û çi bixwaze divê em bikin. Divê em xelkê xwe tenê nehêl in. Me sedsala 20 bi vî awayî wenda kir divê em sedsala 21ê wenda nekin. Lewma pêwîstî bi fedekariyên mezin hene. Divê di warekê de siyaset û di warekê de hunermend destê xwe bidin hev û hêzeke mezin ava bikin. Bi vî awayî em dê bigihejin encameke baş. Heta dijminê Kurdan wan bihêz nebîne dê ligel Kurdan nerûne û dê bi tank û topên xwe li Kurdan bide.” RÛDAW

Ce`ifer Mamilê hunermendekî naskirî yê Kurd koça dawî kir

Ce`ifer Mamilê birayê hunermendê naskirî ê netewa Kurd “Mihemed Mamilê”, di temenê 79 salî de li bajrê Mihabadê li Rojhilatê Kurdistanê bo hertimî malavayî li dinyaya hunerê kir.

Ce`fer Mamilê, çendîn salan xizmet bi hunera Kurdî ve kiriye, navbirî digel “Se`îd Mamilê” hîne waneyên sitranbêjiyê, vehonandina Qetar, xwindina beşte û he-wayên vefayî bibû.

Navbirî di sala 1992`an de digel hin ji hunermendên Başûrê Kurdistanê, berhema “Fêrmêskî Şew” li bajarê Mihabadê tomar kir. Di sala 1995`an de, li bîr û



yada mamoşte Vefayî de ku li bajarê Mihabadê hatibû lidarxistin, amade bû, ku bi vehonandina hunerên mamoşte Vefayî,

pêşwaziyeke zêde û bê wêne jê hate kirin.

Di heyama temenê xwe de, ji aliyê Komeleya Kultûrî a Kurd ve, bo welatê Sû`êd hate gazîkirin û li bajarê Sitokholm û piştî li çend bajarên din ên wî welatî konsêrt lidar xist.

Herwisa di çendîn konsêrt de li Başûrê Kurdistanê û li bajarê Silêmanî amade bû, li Rojhilatê Kurdistanê jî çend carekê konsêrt lidar xist.

Di encamê de ew hunermendê Kurd şeva derbasbûyî li bajarê Mihabadê bo hertimî malavayî li jiyanê dike.

Cawîd Rehman: Di Îranê de ji niviyê zêdetir girtiyên siyasî Kurd in

Cawîd Rehman, Raportêrê Taybet ê Saziya Neteweyên Yekgirtî li Karûbarê Mafê Mirov Li Îranê, Di rapora xwe de li derheq girtiyên Îranê ragihandiye ku, Nivîya hepsiyên siyasî yên ku bi tohmata “têkdana dijî tenahiya netewî” hatine binçavkirin Kurd in, û di heyama 8 mehên yekem a sala 2019’an de zêdetir ji 352 welatîyên Kurd hatine binçavkirin.

Ew rapore li 43’emin civîna Şêvreyaya Mafê Mirov a Saziya Neyteweyên Yekgirtî ku di rêketa 24’ê Fêvrîye de bi



rê ve diçe, dê belav bike.

Rêketa 9’ê meha Mars, “Cawîd Rehman”, Raportêrê Taybet ê Saziya Neteweyên Yekgirtî li Karûbarê Mafê Mirov Li Îranê, di rapora salane ya xwe de pêşkêşê Şêvreyaya Mafê Mirov li

Neteweyên Yekgirtî di Jinêvê de dike.

Li civîna Şêvraya Mafê Mirov li Saziya Neteweyên Yekgirtî li Jinêvê, Nûnerê Komeleya Mafê Mirov a Kurdiştana Îranê-Jinêv, çend gotinek li derheq rewşa kolberan pêşkêş dike.


Komeleya Mafê Mirov a Kurdiştana Îranê-Jinêv yekek ji çavkaniyên cihê bawerê ye ku raporên xwe li derheq binpêkirina mafê mirov li Îran pêşkêşê Saziya Neteweyên Yekgirtî dike.

Du hepsiyên siyasî yên Kurd bo benda Ciwan a girtîgeha Urmîyê hatine veguhaştin

Roja Yekşemî, 27’ê Rêbendanê, 2 hepsiyên siyasî yên kurd bi navên “Kamran Derwîşî û Siyamek Eşrefî”, ji benda hepsiyên siyasî a girtîgeha Urmîyê bo benda Ciwan a wê girtgehê hatine veguhaştin.

Bi gotina çavkaniyekî agehdar, ew 2 hepsiyên Kurd, li roja 26’ê Rêbendanê, dest avêtibûn girev girtinê, û berpîrsên girtîgehê, bi hêceta cîbicîkirina xwestên wan û berdana wan, ew bo benda Ciwanan a girtîgehê veguhastine.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Benda Ciwanan a girtîgeha Urmîyê, rewşeke pir dijwar heye û armanc ji veguhaştina



wan 2 hepsiyên Kurd, dawî anîn bi girvgirtina birmçîbûna wan e”.

“Siyamek Eşrefî”, li roja Sêşemî, 1’ê Rêbendanê, dest avêtibû bi gireva birçîbûnê.

Herwisa “Kamiran Derwîşî”, li 13’ê Banemer a sala 1395’an, li bajarê Urmîyê, ji aliyê hêzên Îtîla’atê ve, hatibû desteserkirin û bo heyamê 2 mehan di girtîgeha para hewalgirî a îdareya Îtîla’atê de di bin lêpîçênê de bûye.

Ew hepsiyê siyasî yê Kurd, di sala 1390’an de, bi tohmata “endambûn di yeyek ji Partiyên Kurd yên Opozîsyon yên rejîma Îranê”, bi 6 sal heps hatibû cezadan.

Du Kolber di Merîwan û Makûyê de hatine birîndarkirin

Êvara roja Yekşemî, 27’ê Rêbendanê, Kolberekî Kurd ê bi navê, “Kamran Qadirî”, xelkê gundê “Serdûş” a girêdayê bajarê Merîwanê, di encama teqeya hêzên leşkerî yên rejîma Îranê de, birîndar bû.

Ew Kolberê Kurd, li gundê “Dole Bî” a bajarê Merîwanê, bi teqeya hêzên leşkerî hatiye birîndarkirin.

“Kamran Qadirî” bo çareserkirina pîzîşkî, bo



nexwşxana “Bû Elî” a bajarê Merîwanê, hatiye veguhaştin. Ji aliyek din ve jî, di heyamê wan çend rojên derbasbûyî de, Kolberekî Kurd ê bi navê, “Erkan Ebasî”, li nêzî gundê “Dêbek” a girêdayê bajarê Makûyê, di encama teqeya hêzên rejîmê de, birîndar bûye.

Ew Kolberê Kurd, bi bê agehdarkirina berê, raştî teqeyê hatibû û bo tedawiya pîzîşkî, bo nanenda dermanî a bajarê Makûyê hatibû veguhaştin.

Wêneyê merasima rêzgirtin li şehîd “Dr. Qasimlo” li welatê Feransayê

